

## Li Qamişloyê, Newroza Kurdan Bi xwîn û keser derbas bû...!!

### Rêberê Silivî

Êvara cejna netewî ya Kurdan (NEWROZ), di wê dema ku ciwan û gencên Kurdan bi helkeftina hatina cejna xwe ya pîroz li kastînekê ji kastînen bajarê Qamişlo dîlan dikirin, ji nişka ve, hêzên tariyê, hêzên mirinê, yên asayîşa dewleta Sûriyê, berê guleyên xwe yên malmîrate bê şerm û bê fihêfî dane singa wan ciwanên bê guneh, sê xort ji wan li qadê bê can mane, û sê gul weriyane...!! hine din jî birîn bûne...



Belê, wisa bi erzanî, bi xwîneke sar û cemidî, xwîna lawên me di cejna wan a netewî de rijandin. Şûna ku di vê cejnê de ew selikên gul û çiçekan pêşkêşî welatîyên xwe yên Kurd bikin, di cejna wan de dilê wan bi jiyane xweş bikin, bingeha biratî û yakîtiya netewî xurt û asê bikin, mirina reş li Kurdan belav kirin, dilê wan di cejna wan de melûl û xemgîn kirin...!!

Sibeha Newrozê, Kurdan reş girêdan , bi beşdariya cemawerekî mezin digel serokatîya tevgera kurdî li Sûriyê, termê hersê pakrewan li ser milan hate danîn, bi gul û çiçekên xemilandî, bi duruşmên mîna **Şehîd Namir e!!** ew di xaka bav û bapîran de li mezelê Hilêliyê hatin veşartin.

Bi rastî, di vê heyamê de, tu rijîm nemane ku, bi devê tivingê bi gelê xwe re dipeyivin , û tu rijîm tune ne bi vî hawî tîkiliyê bi welatîyê xwe re dikin...!! Ma gelo bi kuştin, girtin û lêdanê dozên gelan çareser dibin?.. Ma gelo, bi van ton tîkiliyan çavên gelan tê şikandin û doz bincil û winda dibin?... Ma gelo kuştina welatîyên bê sûc û bê guneh nişana mîrxasiyê ye?..

Divê aqilmendên vê rijêmê( ger hebin) li xwe û pîrsa kuştina Kurdan veşerin, lêkolîneke berpirsiyar çê bikin, bi zelalî encamên wê eşkere bikin, û kesên biryara kuştina Kurdan dane cezayê xwe bibînin. Ji ber ku, ew mirov yan wî aliyê fermana

kuştina Kurdan daye, ewê rojekê fermana kuştina welêt jî bide...!! Ew kesên ku di Avdara sala 2004an de fermana kuştina Kurdan dabûn, dîsa ew in yên ku, îro fermana kuştina me dane. Û eger ew li ber dadgehan ranewestin û bêhna mirinê nekeve pozê wan, her ewê fermanên kuştinê biafirînin, her ewê kîn û zikreşiyê di civaka Sûriyê de belav bikin...

Şoven û kîndarên ku ev ferman dane, mebesteke wan a sereke heye, ew jî di baweriya me de ewe ku, doza Kurd li Sûriyê ji naveroka wê pûç û vala bikin, dozê ji raya giştî ya Ereb re bidin xuyakirin her weku dijminatî di navbera Kurd û Ereban de heye, kurd dixwazin Sûriyê digel welatîyên wê daqurtînin...!! , û bi her hawî ew dixwazin ku rikberî û dijminatî têkeve navbera Kurd û Ereban û rastî di bin toz û dûmanê de winda



bibe...Lê, Kurd û Ereb jî bi vê bend û davê, bi vê plana rûreş dizanin. Wan tucarî ev şaşîfî nekiriye û wê di paşerojê de jî nekin. Ji ber ku, her kes dizane dozeke kurd

a dadmend û rewa li ber destê karbidestên welêt heye, û çareseriyê dixwaze. Biraderên Ereb, Asûr, rewşenbîr, hezkerên demokrasî û berevedêrên mafên mirovan ji doza birayên xwe yên Kurd re piştgir û alîkar in.



Rêz û silav ji giyanên pakrewanên Kurd re, serê gelê me sax be, tendurustî ji birîndaran re, û azadî ji girtiyan re. Em hêvîdarin ku, Newroza bê li ser gelê me bi kêf, ken be, û gelê me yê Sûriyê bi tevayî, bi hemî neteweyên xwe ve di rewşeke çaktir de be. Û her bijî Newroz, sembola azadî, mirovatî û wekhevîyê.